

Xwepeyvîn:

Dr. Hussein: “Ez Romannivîsê Jiyana Rojane me...”

Ayhan Geverî

ayhangeveri@gmail.com

Heta niha min gelek hevpeyvînên kurt û dirêj yan jî yên bêkêr û serkeftî di rojname û kovaran de weşandibûn. Lê hindî vê hevpeyvînê dilê min nequtabû. Ustad ew çend sal e li derveyê welat bû. Yanî çawa “ew çend sal”? “Ew çend sal”ên wî ji temenê min dirêjtir bûn... Ne wekî her car, vê carê min ecele dikir, eceleyek ji lezûbezê hatî xemilandî. Min dixwest ez zû biçime cihê hevdîtina me. Jixwe telefona Ustadi jî nebû, bi rêya hevalekê min ev hevdîtin dabû pêkînan. Wêca eger ez dereng jî bimînim ev heyecana min dê ji kîsê babê min biçît.

Piştî bîstekê otobusa Teqsimê hat û ji ber ku baraneka wekî ron-dikên dayîkan dibarî, herkesî xwe avêtibû otobusê. Ditirsiyam ku ez neşem siwar bibim, otobus biçit û ez dereng bimînim. Lê min xwe çir kir û bi zorê be jî min xwe di otobusê quta. Baran jiderve çend dijwar bû, kekel û germa nava otobusê jî eynî wisa...

Li aliyekê re min cihê xwe xweş dikir ku da ez piçekê hema piçekê bêhnê werbigirim, li aliyekê jî pirsên xwe di hêşê xwe de min

dubare û ducare dikirin. Gelo rêza pirsan rast bû? Eger sohbetek xweş çêbû, ez vê hevpeyvînê bidime kovara me yan kovareke dî? Ka pirsê muhîmtirîn kîşk e? Yan pirsêk wisa maye ku min jibîr kirî?

Piştî ku ez ji otobusê peyabûm û min Tunel û Lîseya Galatasarayê li paş xwe ve hêla, bi heyecan û hizr û bîrên têkelêk ez geheştîme ber wê xana ku me dê hevdîtin û hevpeyvîn lê kiriba. Li gor adresa li ser kaxeza di destê min de nivîsiye ew cih di qata sêyê û daîreya 11ê de bû. Avahiyek tarîxî û kevin bû. Qey ji filmek sînemayê şerîdek bû yan jî ez niha di qadraja kameravanekî pişpor de dimeşiyam ku di vizorê de bez û kelecana min; qeyd û tomara min dihate kirin. Hêdî hêdî ji merdivenan jêhel diçûm û çavê min li asin û şîşikên asansorê... Te dê gotiba asansor ji vê avahiyê kevintir bû û bîna li ser vê asansorê avakirine... Çaxê ez pêlekan û merdivenan re diçûm nişka ve kelîmeya “derece”yê hate hizra min, ku di Kurdî de bo çî dibêjine nerdivanan “derece”...? Ya rastî jî dereceya van nerdivanan gelek zêde bû, qey ez li dûv xwe 360 dereceyan dizivîrîm...



Derê daîreya 11ê derek mezin û fireh bû. Derên daîreyên di jî mezin bûn lê pêş çavê min ev dere mezintir xuya dikir, belkî jî ber hindê bû ku ez niha li ber vî derî me û hema bêje helma ji devê min diçît li ser rûyê derî wekî xunavê peyda dibit û hema berze dibit... Belkî jî çavên min piçûk, tiştên ku çavên min ditînin mezin bibûn...

Demek kurt, piştî qutana derî, xanimêk nêzîkê 40-45 salî, ku xuya bû li vî ofîsa hevala Ustad wek sekreterekê dixebitî, derî bo min vekir û ligel gotina "hoşgeldiniz..."ê cihek nîşa min da ku ez lê birûnê... Xanimêk nazik û sempatîk xuya dikir. Dengê wê bereqşê wê, te dê gotiba hêjta bîst salî ye. Cil û bergên wê sade û lihevhatî bûn. Li ser rûyê wê kenek, girnijînek veşartiyî hebû. Qey te dê gotiba hema dê li ser rûyê wê tişteke enteresan biqewime... Erê biqasê ku ez hatim ketime jorve heta niha di hêşê min de pîrsek nepenî hebû, haya min jê nebû. Tenê di zihnê min de hêdî hêdî geş dibû. Lê piştî cewaba pîrsa min hat, pîrs jî bo min eşkerebû. Belê min digot ev jinika rengê kê dide, çima rûyê wê evqas bo min nas û aşîna dihat...? Himm, hema di dîtina ewil de li ser rûyê wê, min ew xanima cînara me dîtibû. Li ser rûyê Mujgan Xanimê jî eynî ev ken û telaşa hebû. Jinikek gelek ecêb bû. Hemû cînarên me li hember wê eynî tişt digotin. Jiber ku gelek caran ez di odeya xwe ya mezin de rûdiniştim û min yan pîrsên hevpeyvînekê amade dikirin, yan jî li ber televizyonê temaşeya turnuvaya tennisê dikir û diketime nava heyecana Wimbledonê, Mujgan Xanima ku li hember bînaya me jî dê gelek caran di eynî gavê de cilik û çarşef marşefên şuştiyî li ser

ristika xwe raêdixistin. Min digot yan sebebê vî tesadûfê pîrsên min yê hevpeyvînan in, yan jî ew di rojên turnuvaya Wimbledonê de balava xwe û paqijiya mala xwe diket... Kengî min ew li ser balkona wan dîtiba ku ew cilikan radixe ser ristîkê û ez jî bi pîrsan yan jî êrîş û hemleyên Federer yan jî wekî gelek caran bi temaşeya "serve"ek Serena Williamsê ve meşxûl im, min ew hizra wê tesadûfê bo xwe dikir. Lê piştî ku min ji devê jinên cînar bi tesadûfî bihîstî, ew hizra min ji serê min bar kir û min mesele fam kir: "keçê dîne, tu dibînî îro jî Mujgan rizî balav kiriye, hemû cil û berg û çarşef marşefkên xwe şuştine." Ya di bersiva wê dida: "erê malnexirabê, îro jî mêrê wê ne li mal e, çûye jiderve. Bi Xwedê eger mêrê wê jînikê deh-panzdeh rojan ser-yek li malê bimîne dê mala Mujganê ji qirêjê biqulipe."

Min herdu rû dabûne berhev bêhemdê xwe û ez ketibûme temaşaya herdu rûyan di rûyekê de... Jinişkêve xanima kena rûyê wê wekî ya Mujgan Xanima cînara me ez bi dengê xwe yê bîst salî, ji vî temaşayê hişyar kirim: "Kerem ke ezbenî, Mr. Hussein li benda cenabê te ye" û kete pêşiya min û ez jî li dûv wê... Em di korîdorek teng û dirêj re derbasbûn. Herdu aliyên korîdorê ron û temîz bûn. Ji ber ronîya lampên rengareng her pêngavekê carekê hem pêşiya me geş dibû hem jî bi ronahiya lampeya din ew ronahî dibû sîber... Dîwarên korîdorê ji erdê heta nîvekê bi boyeyek şînê esmanî ve hatibûne xemilîn û bi herdu aliyan ve jî seranser korîdor bi tabloyan ve tijîkiriyî bû. Di navbera her tabloyekê de mesafeyên mûeyyan û întizamek berbiçav hebû.

Çarçoveyên wan tabloyan jî eynî wisa, ji eynî estetîk û rengî... Lê di her tabloyekê de uslûb û şîweyek cuda, şekl û sûretên cuda cuda... Min qet ji hunera şîwekarî, ressamî û fotografvanîyê fêhm nedikir, lê gelek aşîkar bû ku ew tablo gelek bi hostayî hatibûne çêkirin û ji tabloyan wêdatir, te dê gotiba ew fotograf bûn...

Di wê odeya ku ez bi refaqeta wê xanima nazik ve ketimê de jî eynî tablo hebûn ku çavê min nişka ve kete wan, lê tenê sê-çar heb bûn... Ode temamî bi kitabên ve tijî bû. Li ber pencerê bi muqabilê hev du qoltix hatibûne danîn û Ustad jî li ser yekê rûniştibû û kitabek ji ber çavan re derbas dikir. Gava em ketine hundir, bi nezaket rabû destê xwe dirêj kir û got: "tu bi xêr hatî!"

Min hema bêje hemû kitabên Ustad Hussein xwendibûn û belkî dehan roportajên wî min ji bo vî hevpeyvînê dîsa bi hûr û kûr xwendibûn. Rexnegîran gelek qîmet dida berhemên wî û li ser berhemên wî di rojname û kovarên edebî de dinivîsîn û ew berhem tewsiyeyê xwendevanên xwe dikirin. Hema bêje ew hemû nivîs û gengeşiyên di navbera wan rexnegîran yê li ser berhemên Ustad, belê hemû, li bîra min bûn... Min digot ez wî baş nas dikim lê ya rastî min taze fêhm kir min ew li derve dîtiba min nas nedikir. Min ew ne, lê min berhemên wî û qehremanên wî baş nas dikirin...

Li hember wî rûniştim û min xwe pê da nasîn. Piştî ew hatiye Turkiyê eve du hefte ye di medyayê de hema herro derheqê wî de nivîs û nuçe derdikevin. Gelek hevkarên min jî li dûv wî bûn hema çend

pirsên kurt lê bikin. Ji berwê, niha ez li hember wî rûniştibûm û heyecana min zêdetir bû... Min bi dengê nizim û minnetdar sipasiya xwe lê kir ku wî ez ji bo vê hevpeyvînê qebûl kirim, û min qelem û kaxezên xwe derêxistin û dane ber xwe, cîhaza qeydê jî min li ser masê danî navbera xwe û wî... Û min bi heyecan dest bi hevpeyvîna xwe kir û pirsên xwe rêz kirin:

Ustad ew salên gelek dirêj in ku cenabê te li dewletên xaric ma, tu li gelek welatan mayî. Beriya derketinê tu li Stenbolê bûy û piştî çûnê jî Stenbol her dem ligel te bû. Ez bêjim te ew jî ligel xwe biribû ku Stenbol di gelek berhemên te de hem wekî mekanekê hem jî wekî qehremanekê cih digire... Îro tu dîsa li Stenbolê yî. Stenbola îro te çawa dît..?

Stenbol wekî te jî gotî di berhemên min de qehremanek sereke ye, belkî min ew ligel xwe nebiribû... Lê qey ez qet ji Stenbolê cuda nebûme. Hindek qehremanên min hene birastî jî ez nefretê jê dikim, tu dê bêjî ka qatîlê temamê binemala min in. Ez di jiyana rojane de gava wan dibînim, dixwazim wan bikujim, yan jî belayekê bînimê serê wan. Lê hindek qehreman jî hene ku eger can bixwazin ez belkî hêšta beriya xwestina wan, canê xwe li ber piyên wan birêjim. Wêca Stenbol jî bo min qehremanek wisa ye ku can û tenê min jê cuda nebûye... Jê re feda bûye... Lê helbet ne Stenbola 30 sal berê ye Stenbola îro. Gelek mezinbûye, hejmara însanên wê zêde bûye... Eger ez berê ne li vî bajarî bam, piştî vê hatina xwe belkî ez niha jî Stenbolê tirsibam... Lê her çawa

be jî Stenbol qehremanek sereke ye, sebebê gelek berhemên estetîk e...

- Mamoste dixwazim em li ser berhemên te bipeyivin. Piştî her kitabek te çapbûyî gengeşiyên mezin çêbûne lê piştî romana te ya herî meşhûr "Dîwana Melayê Cizîrî: Teoriya Mirinê" çapbûyî gelek kesan êrîşê te kirin. Digotî çawa tu dikarî bibêjî Melayê Cizîrî di Dîwana xwe de behsa kuştina xwe dike? Wekî ku te jî di romana xwe de nivîsî ku Melayê Cizîrî ji destê feqiyek xwe hatiye kuştin û roja ku ew feqiyê dê bibe qatîlê Melayê Cizîrî hatiye dunyayê û heta ku qetla xwe bike, Melayê Cizîrî ew feqî parastîye. Gelek caran ew biriye ser Birca Belek jê re xezel û qesîdeyên nû-resîde xwendine. Hetta tu dibêjî Melayê Cizîrî di gelek şîirên xwe de navê wî feqiyê qatîlê xwe jî daye û bi hisêba ebcedê cih û zemanê kuştina xwe jî gotiye... Li gor romana te Şahê Osmanîyan, Şahê Safewîyan jî daye gel xwe û ji bo kuştina Mela ji qatîlên pîspor çeteyek berhev kiriye. Çîroka wê romanê te spartîye rastiyên tarîxî yan romaneke fictîfe? Xwendevan jî wê yekê gelek meraq dikin...

Ew romana ku rexnegîr li ser wê deh rûpel rexneyan di rojekê de dinivîsin min tam di 15 salan de temam kir. Min lêkolînên gelek kûr û dûr kirin, li ser felsefe û tarîxa Îslamê, li ser teorî û estetîka Îslam û Tesewufê, li ser ilmên dînî, hisabê ebcedê, tezhîba herrengî çî xetê reyhanî çî xetê dîwanî çî yê şikeste... Li ser usûl û adabên terîqetan û piranî jî li ser Neqşî, Mewlewî û Qadiriyan.. Her wisa li ser şîira klasîk ya Faris û Erebi û Tirk û Hindiyan... yanî min mesaiyek gelek dûrdirêj li ser haziriya

wê romanê kir. Gelek caran min digot; ew karê min hemû jî kîsê min çû. Lewra min her tiştê xwe berhev dikir û her lêkolîn tam û di cihê xwe de bû. Lê gelek caran kêmasiyên wek bêîlhamiyê derdiketin. Yan jî ji tirsê min nedikarî ez dest bi romanê bikim... Ji acizbûna rûhê Melayê Cizîrî ditirsîyam... Nêzikê salekê jî ber vê tirsê min dest bi romanê nekir... Min hema tenê *Dîwana Melayê Cizîrî* dixwend... her û her.. êdî gelek caran dengê min li min vedigeriya... Lê baş bû piştî ku min bi ruhaniya ruh û îlhama Mela destpê kirî, destpêkirina romanê di nêzikê salekê de xilasbû.

Wêca meseleyên li ser nave-roka romanê helbet hem fictîf in hem jî rastiyên tarîxî ne. Min di akademiya Ewrûpayê de gelek dost û hevalên dîroknas û pisporên navdar hene. Ez her dem ligel wan di nava muzakere û lêkolîn û pirsûbersivê de bûm. Min hema bêje lêkolînek wisa kir ku ez bibêjim, min her rojek Melayê Cizîrî tesbît kir, nabe derew. Lewra ew di *Dîwana* xwe de gelek îşaret û referansan dide. Ez nabêjim tenê hatiye kuştin, lê gelek caran jî neyarên wî û hunera wî, xwestine suîqestê lê bikin, lê ew her car jî qatîlên Şahan xilasbûye. Wekî wî jî digot; her seher çeteyek li dûv kuştina wî bûye:

Şah bi qesda kuştina min rim hejandin bê sebeb

Dame çeşmê qehr û xeşmê rim li dil da ku edeb

Kuştiyên dîdar û dîne bêxeta her deh sed in

Her seher dîsa ji nû wên tene kêre sed celeb

Romana *Dîwana Melayê Cizîrî: Teoriya Mirinê* hem romaneke fictîf e hem jî romanek ji ava rastiye têrvexwarî ye. Meseleya qetla Melayê Cizîrî hem di arşîvên dewletên Osmanî û Îranê de hem jî di yên dewleta Îngilîz de hene. Lê tu carî ew aşkere nebûne. Li gor hevalên min yên dîroknas, ev kêra ku Mela behsê jê diket û pê hatiye kuştin, nêzîkê dused salan di Seraya Osmaniyan de hatiye muhafezekirin. Piştî ku Îttihad Teraqiyê li welat hakimiyet girtiye destê xwe aqîbeta wê kêrê jî bûye muemma. Melayê Cizîrî her dem xwestiye wê çeteya eşqiya deşîfre û eşkere biket. Lê kesî guh bi dengê wî nebûye, gazindeyên wî negeheştine kesekê. Ne Mîrê Cizîrê, ne Mîrê Culemêrgê ne jî yê Amêdiyê... Ji ber wê Mela piranî ev beyta xwe dubare dikir. Hetta murîdên wî yên feqîr wekî tesbîhatê ev beyt piştî her nimêjê dubare dikirin. Wan nedizanî Mela îşareta rastiyekekê diket:

Şakî's-sîlahî her dem bi kuştina Melê bit

Gazindeyan ji kê kim ji kê bikim şikayet

Wî her tişt fêm kiribû. Erê her tişt. Wî ew zanîn û têgeheştinên xwe geh bi remz, geh aşkera geh jî bi rêya ebcedê îşaret kirine. Mîsalen beriya wê beyta min taze bo te xwendî di destpêka xezela xwe de behsa bêfaydebûna feriyada xwe diket:

Kes bi dada me nepirsit gilleh û dadi çî kit

Te nebitin dadiresek beyhûde feryadi çî kit

Mela ne tenê filozof û mutese-wîfekî mezin bû, ew dedektîfek mezin bû ku wî ev organîzasyona

şakî û şîfreyên wê aşkera kirine. Lê lêkolînerên me yên edebiyata klasîk ji ber wê romana min dîn bûn û gotin te Melayê Cizîrî li erdê daye, te bêedebî lê kirine. Ew beytên min di romanê de dane, çî ne, remzên evîndariya wî ya îlahî ne. Haya wî ji tiştên wisa nebûye... Ez tiştê nabêjim, tenê ew jî şikleke fikr û şîroveye ye... Ez wê dibêjim...

- *Mamoste ya rastî bersiva gelek pirsên ku min hazirkiribûn te da. Lê te bi navê "Antolojiya Çirokên Çiroknivîsên Meqtûl" jî antolojiyek amade kir. Ew kitab jî te dîsa li ser çiroknivîsên hatine kuştin nivîsiye, wekî kuştina Mela... Çima ewqas kuştin, mirin û êş...? Jixwe em dizanin cenabê te piranî di çîrok û romanên xwe de jî li ser mijara "êş"ê rawestiya ye û qehremanên te jî gelek caran di nava êşê de digevizin. Car car jî tu êşê wekî metaforekê bikartîni. Gelek rexnegîr dibêjin ku Ustad Hussein nivîskarek "Masoshîst" e, "Sadîst" e, îşkenceyê li xwe û lehengên xwe dike. Li ser wê tu dikarî çî bibêjî.?*

- Êş û mirin û kuştin rastiyeke jiyanê ne. Belê di biyografiya wan hemû çiroknivîsan de jî nivîsiye û eşkera ye ku ew hemû bi şikleke hatine kuştin, ma ew jî fictîf e? *Anolojiya Çirokên Çiroknivîsên Meqtûl* neba kesê nedipirsî ka çawa ewqas çiroknivîs hatine kuştin. Lê ew rastiya vî welatî ye... Min tenê çirokên wan berhev kirin, kirine kitabek...

Eger ez bême ser meseleya dî, bila ew rexnegîr pêşiyê Sade û Masoshi binasin û bixwînin, êşkêşan û Masoshîzm çawa dibe eynî tişt? Qet pirsê li xwe nakin? Ya rastî rexnegîrên welatê

te jî romannivîsên welatê te jî ji xwendinê bêpar in. Ew bi xwe di nava êş û ezabê de ne...

- Êş û ezaba çî ezbenî?

- Êş û ezaba nezanîn û nexwendinê û mehrûmîyeta nivîsîna berhemek edebî û baş... Ka çend rexnegîran hay ji Terry Eagleton, Mikhail Bakhtin, Walter Benjamin, Gilles Deleuze û Félix Guattari heye. Romannivîsê me mixabin êdî xwedan wê êşa berê jî nîne. Lewra berê bi xêra êşekê berhem dihatine nivîsîn, lê êşa îro di nava romannivîsên me de belavbûyî tenê dibe sebebê edebiyateke zêf û îfade û vegotinekê ji edebiyat û estetîkê dûr...

- Gelo sebebê wê çî ye?

- Sebeb gelek in, nexwendina edebiyata cîhanê sereke sebeb e. Lê êdî edebiyat bûye kareke zehmet... Bûye bazarek, ferqa benûstekê, pêlavêkê û kitabekê nemaye... Lê binêre Kapitalîzm ziman pûç dike, ziman statîk û standart dike. Herkes dibe mehkûmê marqeyan û êdî dibînî romanên li ser evîna Xwedayî jî di marketan de têne firotin, tu 10 lître benzînê dikî depoya ereba xwe, benzînfiros dibêjê te "abê di karta te de puanên te têra dike, eger tu 4 lître û nivî dî benzînê bikirî emê romanekê bidine te li ser evîna Şems û Mewlana hatiye nivîsîn. Romanek gelek balkêş e, min nexwendiyê lê wisa dibêje patronê me..."

Ya rastî edebiyat û nivîs ne tiştê masûm û bêguneh e jî. Lê halê edebiyata me û romana me diwartir e. Wekî tu jî dizanî "Zimanê Netewî" bi rêya romannivîsîna tete avakirin. Ew jî pêvajoyek e, projeyek e. Walter Benjamin navê wê pêvajoyê da-

naye: "Zemanê Hundir-vala". Benjamin dibêje, "Zemanê Hundir-vala navê pêvajoya "afirandina" neteweyekê ye." Wêca zemanê hundir-vala bi du tiştan ve tête tijîkirin: yek roman, du rojname... Belê romannivîsên me bo me romanek û ziman û edebiyatek netewî ava kirin. Lê lazim bû ev ziman û edebiyat ji dunyaya romannivîsên me geştir û dewlemendtir ba, hem bi êş û janên xwe ve hem jî bi dilşadî û keyfxweşiyên xwe ve... Di romanên me de êşa nivîskar li nav çavê me dide, di her rêzekê de di her paragraf û rûpelekê de fantezî û kompleksên romannivîsê me li nav çavê xwendevan dikevin... Romannivîsên me yên êşperest...

- *Belê, eger em bîn ser pirsarê di... Mijara êşên qehremanên te...?*

- Ez êşê wekî metafor û temsîlekê di çîrok û romanên xwe de bikartînim. Jixwe ev yeka eşkera ye. Lê çî caran min êş nekiriye amanc û mijar. Û ji ya wê muhîmtir jî ew e ku, çî caran qehremanên min êş-kêş nebûne. Qehremanê di eserên min de xwedan-êş in, lê êşa wan ji fikra wan ya li ser azadiyê, ji xewn û xeyalên wan, ji hezkirinên wan mezintir nînin û nebûne... Ez ne romannivîsek Rusî yan jî Frensî me. Êşa ku di civaka ez lê mezin bûme de qet tu caran nebûye êşek şexsî û takekesî. Di civaka me de jixwe firseta wê hîç nebûye...

- *Lê navê çîroka te, ya te ewil tercumekirî û di hejmara 287ê ya kovara Nûbiharê de weşiyayî jî ÊŞ e. Her wisa tu li ser "Teoriya Êşê" jî sekiniyî û derbareyê wê mijarê gelek meqaleyên te yên akademîk jî weşiyane...*

(Ji vê pirsarê min qey pîçekê aciz bibû, rûyê xwe hinekê tirş kir, wek ku mamosteyek problemek basît ji bo telebeyek xwe yê bêaqil dubare biket, got)

- Ez dîsa dubare dikim. Ez teorisyenê êşê me. Li ser teorî û pratika êşê akademiya cîhanê girîngiyek gelek mezin didete xebatên min yên li ser vê babetê. Lê êşa qehremanên min nîne. Jixwe eger tu listeyekê çêbikî tu dê bibînî hejmara qehremanên min -yên di hemû berhemên min de- ji dehan naborin. Ez ne Dostoyevskî me. Qehremanên min û çîrok û romanên min rasterast di jiyana min ya rojane de.

Ne ez hindî Dosto hosta û şaraza û cesûr im, ne jî qehremanên min wekî Raskolnikov xurt û têgeheştî û zîrek in. Tu caran ez nebûme xwedan qehremanên wekî Mösyö Goriot, Kontes Henrietteyê, eger qehremanên min yên wisa heban ez jî dê bibame romannivîsek wekî Balzac...

(Ustad dipeyivî lê Mujgan Xanimî cînara me li ser van gotinên Ustad hate bîra min... Gelo Ustad ew jinik nas kiriba ka dê ew di romanek xwe de çawa vegeandiba qehremanekê.. Gelo di romana wî de dê Mujgan Xanim biba wekî Kontes Henrietteyê? Gelo min behsa wê bo Ustad kiriba..!?)

Min çî caran cesaret nekir ez mekteba xwe nîvcu bihêlim û bikevime kolanan... Lê mîna J. D. Salînger jî min neşiya ez qehremanek wekî Holden peyda bikim... Ez ne romannivîsek serkeftî me ne jî xwedan qehreman. Romannivîs û çîroknivîsên serkeftî di metn û hêşên xwe de leheng û qehremanan çêdikin û dikujin. Lê ez romannivîsê jiyana rojane me.

Qehremanên min dostên min, hevalên min û insanên li derûdora min in. Ez wan daxilê metnên roman û çîrokên xwe yên rojane dikim... Ew mêvanên metnên min in... Her yek ji wane li gor senaryoya xwe di romanên min de tîn û diçin. Lê gava yekî ji wan tamatî û cimrîtî kir yan jî nemerdî û îxanet kir, ez hingî wî qehremanî di metna rojane de dikujim û ji ber wê ye ku qehremanên min yên di romana rojane de ji yên romanên rastî kêmtir in...

Lê ez ne nivîskarek serkeftî me, çawa ku Walter Benjamin goti: "*Heke murekkeba qelema min wekî dükela cigara min bi hêsanî herikîba, aha hingî ez dê di beheştê nivîskariya xwe de bam.*"

(Piştî vê gotina xwe rûyê wî hinekî sorbû, destê xwe avête berîka xwe, ji berîka xwe pakêta cigarê û ji pakêta jî cigarek derêxist... cigara xwe berdayê û pakêta cigarê havête ser sêpayê û kibrît jî havête ser pakêta cigarê... bêhnêkê bê deng ma.. Lê ez ditirsiyam ku eger ez pirsên xwe nekim hema dê hevpeyvîna min evqas bit... û min jî dewam kir..) Ustad min meseleya êşê fêhm kir lê di navbera te û eserên te û mirinê de têkiliyek gelek ecêb heye. Mîsalen îsal 20. Salvegera mirina nivîskarê Leyl-nameyê bû û li gelek cîhan jî ji bo vê salvegerê semîner û sempozyum hatine lidarxistin. Îsal ji bo nivîskarê Leyl-nameyê organîzasyonê mezin hate kirin û te jî bi mesaiyek muezzem, bi xebatek şev û rojan berdewam kirî, te pirtûka xwe Şerha Leyl-nameyê xilas kir û te gehande wan organîzasyonan... Mirin çima evqas mêjiyê te meşxûl û şêlû dike?

(Ustad, axînek kêşa... Çawa ku ez di rojên turnuvaya Wimbledonê de Federer û Nadal li hemberê hev bibînim û bikevime heyecanê eynî wisa niha li hember Ustad ketime heyecanê. Wek Ustad min jî ji heyecanê dixwest axînekê bikêşim... Lê wî çend firt li ser hev ji cigara xwe da û kêşa, ji pencerê temaşeya bajêr kir... Paşî req li nav çavê min nêrî û destpê kir)

- Mirin... ez zarok bûm, ew çend sal bûn min dest bi mektebê kiribû... Min gava dîtir bo te behsa romana Salînger kir, behsa qehremanê wê romanê Holden kir. Aha ez hingî wekî Holden bûm, min nefret ji mektebê dikir. Lê babê min her digot "min çekîtê xwe jî firotiye ez dê te bideme xwendin!" Vê cumlê zarokatiya min xwar...! Min nefret ji mektebê û zarokên li mektebê dikir. Gava min nexwestiba ez biçime mektebê min zikê xwe diêşand û min digote dayîka xwe ez nexweş im. Dayîka min dê unîforma min li min kiriba û dê serê min şe kiriba. Û bi serşekirinê ve jî dê her gotiba: "ez gorî te, dayîka te gorî te... Dayîka te qurbana te..." Ev serşekirin bo min dibû serjêkirin...! Ev gotina dayîka min ji gotina babê min diwartir dihat... Ez wisa diçûme mektebê lê piştî seetekê du seetan bêhna min kurt dibû... Gelek carên wisa bi derewekê diçûme cem mudûrê mektebê û min ew dilêband û ji mektebê direviyam û diçûme nav darên li hember mala me.. Li aliyekê min hem li mala me temaşe dikir, hem jî min roman û çîrok dixwendin... Gelek caran ez diketime nava rûpelên çîrok û romanên xweş, min xwe jibîr dikir. Gava min hay ji xwe dibû, yan pantolonê min di nava ew çîmenê

ez lê rûniştî ter û şil bûye, yan jî ez bi deng û qêreqêra zarokên ji paydosa mektebê belavdibûn dihatime ser hêşên xwe...

Wêca dîsa eynî wisa rojekê bi zorî min mudûr îqna kiribû û ez ji mektebê reviya bûm. Li nava darên li hember mala me bûm... Min çantê xwe vekir û min kitabek derêxist.. Kitabek piçûk bû, ji çend çîrokan pêk dihat.. Min çîroka ewil xwend û ez jixwe çûm... Di dewrê pêxemberêkî de pîrejinekê panzdeh salan dua kiriye bo Xweda ku ew piçûkekê bidete wê... Paşî rabûye çûye nik wî pêxemberî û gotiyê: "Bo çi Xweda duayên min qebûl naket? Ma ez ne ewda wî me...? Duayên Ye'qûb qebûl kirin, Yusûfê wî gihande wî... Zekeriya ji Xwedayê xwe xwest. Wî jî Yehya-yeq wekî şêran da Zekeriya... Ku mêrê min ji Zekeriya pîrtir jî nîne... Ka bêje bo çi duayên min meqûl nînin...?" Pêxemberê wî çaxî jî li hember vê pîrsa jinikê keniyaye... Piştî wê kenê, jinik jî ji qehrên xwe û ji xemên xwe û bi dilê şikestî rabûye ku ji huzûra wî pêxemberî derkevit. Lê pêxemberî gazî kiriyê û gotiyê: "Mizgînî li te bit, tu di duaya xwe de samîmî û sadiq bû. Te bi dilek safî ji Xwedayê xwe xwest û wî jî zarokek li te kiriye mizgînî. Ew zarok niha di zikê te de mezin dibit ji bo wê ez dike-nim..." Jinik piştî çend mehên di bûye dayîk, Xweda kurek çeleng daye wê... Kurik her roj pîçektir nêzîkê zelambûn û mêrbûnê dibe. Sal li ser salan derbas dibin.. kurik mezin dibe, dibe kurek çardesalî. Dayîk û babên wî ji keyfxweşiya mezinbûna wî herro ciwantir û geştir dibin. Her tiştê dayîk û babê êdî dibe ew kurikê çeleng. Hêvî û aso û dewama nesl û îstîqbalê... Lê rojekê wextê ku

Mûsa Pêxember ligel rihspî û zanayekê, ku li gor gotina babê min navê wî zanayî Xizir bû, ketiye rê û piştî wî zanayî keştiyek binav kirî, hatine rastî wî xurtê ciwan, ronahiya çavên dê û baban bûne. Zanayê hevalê Mûsa Pêxember çawa wî kurikê ciwan dibîne, lê dide wî dikuje. Her çend Mûsa gotibit ku "te karek xirab kir, te canek bêguneh kuşt, bêyî qissas te insanek kuşt..!" Lê agir kete mala wê dayîkê... Wêca piştî wê rojê ku min ew kitab û ew çîrokên di wê kitabê de xwendî, mirin bûye merqa min... Eger te ew tabloyên li wê korîdorê dîtibin hemû cuda cuda ne, lê çîroka hemûyan eynî ye: mirin e. Hevalê min yê ressam yê xwedanê vê ofîsê, ji her çîrokek min tabloyek mirinê çêkir... Mirin di her tabloyek me de heyê...

- Mamoste piştî ku te kitaba xwe "**Hunera Xweş-şkandina Şûşeya Dil**" ku ji çîrokên gelek fantastîk pêk tê û ku meha borî jî li vir çapa wê ya 23yê derket, te çi pirtûk nenivîsîn, yan jî nedane çapê. Beriya wê jî te kitaba Tago-re, "**Baxçevan**" te tercume kiribû, derket... Wek çîrok jî vê dîmahîkê çîroka te ya bi navê "**Xwepeyvîn**" di kovara **Nûbiharê** de weşiya û gelek li ser hate axaftin... Piştî wan tu dê mizgîniya xebatên xwe yê nû bidî bo xwendevanên xwe...?

- Pêşiyê dixwazim xeletiyekê serrast bikim, navê çîroka min ya di kovara **Nûbiharê** de weşiyayî ne "**Xwepeyvîn**" bû, navê wê "**Xewpeyvîn**" bû... Hevalên kovarê ew xelet rêz kirine... Wekî dî wextê ku ez li Parîsê bûm, ez û dostê min Elî Şerîetî em her rojên şembiyan diçûne ziyareta ustad Jean-Paul Sartre... Wî jî hingî bo me kitaba xwe "**Qu'est ce que la**

littérature” dixwend û li ser wê kitabê pirs li me dikirin. Beriya ku em ji nik rabin wî parçe ji kitaba xwe didane me û paşî jî Ustad Elî Şerîetî li ser wan hûr û kûr diçû û ew tercume Farisî dikirin. Ji ber ku ew salên pêşiyê bû ez li Fransayê bûm, Fransiya min zêde pêş neketibû. Min jî ji fêmkirina tercumeye Şerîetî ew tercumeyê Kurdî dikir. Wêca ew notên min yên hingî min niha berhev kirin, ji ber çavan re derbas kirin û ji nû ve li Fransiya kitaba Ustad Sartre zivirîm û min ew berhem bi navê “*Edebiyat Çiye*” hazir kir. Eger hevalên weşanxaneya Giyanê destê xwe sivik bikin, ew dê heta du mehan ji nava weşanxaneya wan derkeve.

Nota Nûbiharê: Xwendevanên hêja ji ber 50. Salvegera Mirina Nivîskarê Leyl-nameyê em vê hevpeyvîna ku me sih sal berê weşandî dîsa jinûve diweşînin... Lê ji ber ku hevpeyvîn ji îmkanên rûpelên me dirêjtir bû, me ew kurt kir û wisa da. Ji ber wê em lêborîna xwe ji xwendevanên xwe û yên Ustad Dr. Hussein dixwazin û hêvîdar in ku xwendevanên me li me biborin...■